Sazivan û dîyarî

Zêmar Mihemed zêbarî

Sazivan û dildar hevalên êk bûn li qutabxanê. Sazivanî demê taqîkirina gelek nedixwand û digel hezalan ji der ve yarî dikirin, belê dildarî gelek dixwand û rojên xo hemyê bi xwandinê ve diborand. Demê pêk ve çûyne qutabxanê da encamên xo werbigirin, sazivan bi wanekê kefitbû, belê dildar serkeftyê êkê derikefit.

Sazivanî gote hevalê xo: Ez nabêjme babê xo; çunkî dê ji min ture bît û dîyaryê jî nadete min, belê dildarî amojgarî lê kirin û gotê: Rastyê bêje babê xo, bawer bike ture nabît, belê heger tu direwa lê bikey dê her zanît û dê pitir ji te ture bît.

Demê gehiştîne mal, sazivanî gote babê xo li min bibore bab, ez bi wanekê yê kefitîm belê soz bît ez rakem da ji hevalê xo dildarî dwîr nekevim.

Babê wî jî got: Destxoş kurrê min, madem te rastî got û te soz da bi serikevî, dê dîyaryê jî deme te .